

# AGAHDARIYA TENDURISTÎ

## AGAHIYÊN DURIST DERHEQÊ

### PARASTINA ŞEXSÎ DE



Kurdish Kurmanji | Kurdî Kurmancî

**STARTTS pabend e ku agahdariya tenduristiya we ya kesane li gorî qanûna parastina şexsî bimeşin e.**

#### BERHEVKIRINA AGAHDARIYÊN WE

- Em agahdarîyan rasterast ji we berhev dikin ger mumkin be.
- Ger ev ne mumkin be, yan jî di rewşeke lezgin de, dibe ku hewce bike ku em ji endamekî malbatê, heval, lênerînkaran yan kesekî din ku dikare alîkariya me bike da ku em lênerîna minasib pêşkêş bikin.

#### EWLEHIYA KOMKIRINA AGAHDARIYAN

- STARTTS agahdariya we di tomareke tenduristiyê ya elektronîk de dihêhle ku beşeke ji dangeha komputerî ya ewledar e.
- Heke hûn beriya 2016an beşdarî STARTTS bûn, dibe ku me qeydeke agahdariya tenduristiyê ya li ser kaxezê jî kiribe.
- Em rêgez û polîtîkayên hişk yê di derheqê hilanîna ewledar ya agahdariya kesane de bi hemî şeweyan dişopînin da ku agahdariya we ji gihîştina bê destûr, windakirin yan çewt e din biparêzin.

#### BIKARANÎN YAN EŞKEREKIRINA AGAHDARIYÊ

- STARTTS dikare ji ber sedemên li jêr agahdariyên we bikar bîne yan eşkere bike:
  - Ji bo pêwindiyê bi te re girêbide derbarê çêkirina hevdîtinan
  - Ji bo pisporên tenduristiyê yê din rasterast di lênerîna we de cih digirin
  - Ji bo ku em li ser xizmetên ku me ji we re pêşkêş kiriyê em pêwindiyê bi we re deynin da ku em alîkariya nixandî û pêşvebirina xizmetên xwe bikin.
  - Ji xwendekar û karmendên din re ji bo armancên perwerdeyê
  - Ji xizmetên tenduristiyê yê din re û aliyên sêyemîn yê destûrdar re ku ji bo pêşilêgirtina xetereyê cidî û nêzik derbarê jiyana kesekî, tenduristî, yan başbûna kesekî, wek mînak di rewşeke awarte de, bibin alîkar.
  - Ji bo rêvebir/a daxwaz û kesên girêdayî ji bo birêvebirina giliyan, karên qanûnî yan jî doza li dijî STARTTS yan jî yek ji pisporên me yê tenduristiyê
  - Ji bo mebestên ku bi operasyona STARTTS û dermankirina xerîdarên me ve girêdayî ne, di nav de alîkariya aborî, plansazî, ewlehî û baştirkirina kalîteya çalakîyan
- Heke hûn nexwazin em li ser we tu agahdariyan berhev bikin, bikar bînin yan eşkere bikin, pêwîste hûn ji me bêjin, û em ê her encama ku ji bo lênerîna we hebe nîqaş bikin.
- Qanûn di heman demê de destûr dide yan daxwaz dike ku STARTTS agahdariya tenduristiya kesane eşkere bike, bo mînak:
  - Ji lêkolînerên ji bo projeyên lêkolînê yê berjewendiya giştî têde hebin yê ku ji hêla Komîteya Lêkolîn û Exlaqê Mirovan ve hatine pejirandin
  - Ji xizmetên tenduristiyê yê din yan ajansên bicihanîna qanûnê, wek polis, heke hûn di derheqê sûcekî giran de agahdarî bidin me, di nav de destdirêjî, tudûtûjîya malbatî, destdirêjîya zarokan, û hwd
  - Ji ajansên din re ku agahdarî têkildarî ewlehîyê, bextewarî yan xweşiya zarok yan ciwanan
  - Ger dadgeh yan polis beşdarbûna we li dadgehê de daxwaz bikin yan fermana velokirinê wekî defil ji bo dadgehê daxwaz bikin

#### MAFÊ AGAHIYAN

- Di bin Rêbernameya Parastina Taybet ya Agahdariya Tenduristî ya NSW û Qanûnên Tenduristî û Agahdariya Parastina Taybe 2002 (HRIPA) de, hûn dikarin bigihêjin agahdariya tenduristiya xwe. Xizmeta Agahdariya Tenduristî (HIS) li STARTTS tomarên we yê tenduristiyê ji we re li STARTTS pêşkêş dike.
- Heke hûn bawer dikin ku agahdariya di derheqê we de ya li cem me nerast e yan jî STARTTS şaşiyek kiriye, ji kerema xwe me agahdar bikin, û em ê şaşiyê rast bikin yan notekê di tomara tenduristiya we de zêde bikin.
- Em dikarin di rewşên ne asayî de gihîştina agahdariya kesane red bikin, wek mînak cîhê destûrdayî yê kesekî din têxe metirsiya zirara giyanî yan laşî.

# Ez çawa dikarim tomara xwe ya tenduristiyê li STARTTS bi destxînim?

	MIŞTERÎ	KESÊN DIN	PARÊZER YAN PARGÎDANIYA SÎGORTEYÊ
<b>KOPIYÊN TOMARKIRÎ</b>	Daxwaznemeya ji bo Gihîştina Forma Tomarên Lênerîna Tenduristî		Daxwaza nivîskî di nav de: <ul style="list-style-type: none"> <li>Tevahiya Navê Mişterî</li> <li>Roja Rojbûnê</li> <li>Hewce bi tomara roja dîrokê heye</li> <li>Hûrguliyên taybet yê tomara/agahdariyê pêwîst</li> <li>Divê STARTTS belgeyan bişîne kur</li> </ul>
<b>DÎTINA TOMARAN</b>	Daxwaznemeya ji bo Gihîştina Forma Tomarên Lênerîna Tenduristî <ul style="list-style-type: none"> <li>HIS dê pêwindiyê ji bo hevdiîtinê bi we re deyiye</li> <li>Nûnerê HIS dê bi we re rûne û bersiva pirsên we yê derbarê tomara we de bide. Lê, nûner pirsên psikolojîk şirove nake.</li> </ul>		
<b>BEŞDARBÛN YAN NAMEYA PIŞTGIRIYÊ</b>	Daxwaza Beşdarî yan Nameya Piştgiriyê		
<b>PÊDIVÎ BI NASNAMEYÊ HEYE</b> <i>Mînak:</i> Pasport, Îcazeya Ajotinê, Karta Koçberiyê (Immicard)	Nasnameya Te	Nasnameya Te Nasnameya Mişterî	Nasname hewce nake
<b>RAZÎBÛN</b> (di nav sê mehên ji daxwazê tê xwestin)	<b>MIŞTERÎ</b>	<b>PÊDIVIYA RAZÎBÛNÊ</b>	
	Temên 16+	Mişterî	
	Temên <16	Dêûbav yan Lênerînavanê Qanunî	
	Mirî	Çibicîkirê wesiyetê	
<b>MESREF</b>	Hewceya dayîna pereyan ji bo penaxwazan nake. Ji bo hemû kesên xwedan karta Teqawîtê, konsêşin (Concession) yan jî Kartên Tenduristiyê ji sedî 50 erzantire. Dayîna pereyan ji bo dîtina tomarên te, beşdarbûn û nameyên piştgiriyê hewce nake. Berî ku STARTTS kopiyên belgeyan derxîne divê pere werin dayîn		
	<b>TIŞT</b>	<b>NIRX</b>	
	Nirxê Daxwaznameyê	\$33.00	
	Nirxê Rûpelên Zêde (ji bo tomarên ji 80 rûpelan zêdetir)	\$0.40 ji bo her rûplekê	
<b>DEMA ÇARÇOVEYÊ</b>	<ul style="list-style-type: none"> <li><b>Tew kêm 21 rojên kar</b></li> <li>Ger daxwaza te lezgîn be, tu dikarî di daxwaza xwe de vê yekê nîşan bidî. Xizmetên Agahdariya Tenduristiyê dê daxwaza te bidin pêş, lê ji kerema xwe fêhm bikin ku STARTTS nikare tu garantiyê bide.</li> </ul>		

## GIRÊDANA PÊWINDIYA BI ME RE



Ger pirs yan giliyêke we li ser parastina agahdariya kesane ya we hebe, dudil nebin ku bi xizmetên li jêr yê **Agahdariya Tenduristiyê** re girêbidin:

**Telefon:** (02) 9646 6700

**Email:** STTS-HealthInformationService@health.nsw.gov.au

### ÇAVKANÎ

Qanûna Parastina Şexsî Tomarên Tenduristiya sala 2002 ya NSW Rêbera Parastina Şexsî ya Tenduristiya Agahdariya Tenduristî û Qanûna Parastina Şexsî ya Agahdariya Kesane ya 1998

Qanûnên parastina şexsî yê din û qanûnên têkildar  
Qanûna Rêveberiya Tenduristiya 1982  
Qanûna Tenduristiya Derûnî 2007  
Qanûna Tenduristiya Giştî 1991  
Qanûna Parastina Şexsî ya Commonwealth 1988  
Qanûna Agahdariya Hukumetê (Gihîştina Giştî)  
Qanûna sal 2009 ya Tomarên Dewletê 1988  
Qanûna Zarok û Ciwanan (Lênêrîn û Parastin) 1998